Rонahî

Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1174 | 2-Pûşper-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# 'Parastina çand û hunerê erka me tevan e'



**Delîla Agirî ya 16 salî ku bi ciwantiya xwe li qada şoreşa jin a Bakûr û Rojhilayê Sûriyeyê di xebatên çandî de cih digire dibêje: "Divê em hunera xwe ya Kurdî biparêzin."**

Delîla Agirî di nava malbateke stranbêj û welatparêz de mezin bûye. Bav, xwişk û birayên wê hemû stranbêj in. Bavê wê Rêber Agirî di sala 1989'an de di Koma Agirî ya navçeya Amûdê de cihê xwe girt û bi xebatên hunerî re mijûl dibû, heta ku di sala 2022'yan de jiyana xwe ji dest da xebatên xwe didomand. Delîla Agirî ya bi piştgiriya bavê xwe dest bi xebatên hunerî kiriye der barê jiyana xwe ya hunerî de axivî.

**Di zarokatiya xwe de dest bi xebatên hunerê kir**

Delîla Agirî der barê jiyana xwe ya hunerî de axivî û armanca xwe ya ji karê hunerê anî ziman û got: "Ji zarokatiya xwe ve min ji stranbêjî û hunerê hez dikir. Bavê min hunera Kurdî her dem bi me dida naskirin, di temenê 4 salî de yekemîn strana ku ez jî tevlî bûm klîba li ser şehîd Rustem Cûdî bû. Heta roja îro jî ez cihê xwe di berdevkiya Koma Xweser a Şehîd Delîla ya navçeya Amûde de digrim. Armanca min bi xebatên hunerî ew e ku ez hunera Kurdî biparêzim, bibim jineke hunermend û li cîhanê bi nav û deng bibim. Armanc û xebatên bavê xwe yê şehîd bi cih bînim û riya hezkirina wî ya ji hunerê re berdewam bikim."

**'Huner cihê serfiraziyê ye ji bo me'**

Delîla Agirî bal kişand ser amûrên mûzîkê yên ku bi kar tîne û tevlîbûna xwe ya koma xweser a Şehîd Delîla û wiha domand: "Dema ku min dest bi stranbêjiyê kir temenê min pir biçûk bû min pir zehmetî kişand. Gotinên stranan û ezberkirina wan ji bo min zehmet bû. Lê niha her tişt hêsan dibe. Bi stranbêjiyê re jî bavê min ez fêrî amûrên muzîkê kirim weke tembûr, def û dahol. Ez berdevkiya Koma Xweser a Şehîd Delîla dikim. Di komê de em 7 jin stranbêjiyê dikin û beşdarî gelek şahiyan bûn. Di rojên Newroz, 8'ê Adarê û 4'ê Nîsanê de huner û stran gotin, cihê serfiraziyê ye ji bo me."

**'Bavê min bi coş û kelecaneke bilind tevlî şahiyên Newrozê dibû û eşqa hunerê dixist dilê me'**

Delîla Agirî diyar kir ku ne tenê ew di malê de stranbêj e û teqez kir ku wê heta dawiyê ji bo hunera Kurdî kar û têkoşînê bidomîne û wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Di nava malê de ne tenê ez stranbêjiyê dikim, xwişk û birayên min jî stranbêj in. Ew li ser, riya bavê min stranbêjiyê dikin ji ber ku dema me didît bavê min bi coş û kelecaneke bilind tevlî şahiyên Newrozê dibû. Karê hunerê dibû sedem ku hezkirin û eşqeke mezin ji hunerê re bikeve dilê me. Weke du hevalan bi hev re em tevlî komên xwe dibûn. Heta dawiyê jî bavê min dev ji doza Kurdî û karê hunerê berneda, heta ku şehîd ket. Heta dawiyê em ê jî li ser şopa wî bimeşin û ji bo doza Kurdî û hunera wê bixebitin û têkoşînê bidomînin. Diwazim jinên ciwan ên dengê wan xweşe stranbêjiyê bikin û ji tu gotinan netirsin û bila her dem malbatên wan piştgiriya wan bikin da ku em hunera xwe ya Kurdî pêşbêxin û biparêzin." **NÛJINHA**

# Destar

Destar, du kevirên pan in, di danîne ser hev û dibe aş; ew aşê destî ye. Jixwe peyva dest+ar, yanî arê bi dest tê çêkirin. Wateyeke wiha ji vê peyva hevedûdanî derdikeve. Yê serî di nîvekê de kunkiriye û aliyekê wî darkekî wekî destkî pêve zevtkiriye ku li ser yê din bihête zelandin. Her du kevir jî gilover in. Yê binî sabit e û yê ser bi hêza destê mirovî bi alîkariya wî destkê li ser tê zivirandin. Bi vê zivirandinê re tiştên den, dane bin dihêne hêrandin.

Ez dibêjim niha wê bihîstiye, strane- ke Tehsîn Taha, ya bi navê "Bihêre destar bihêre" heye. Dibêje; "Bihêre destar bihêre bihêre, Xemê'd me gelek giran in giran in,
Bihêre destar bihêre bihêre,
Xemê'd me gelek giranin bihêre,
Dengê destarî girîn e û hewar e,
Ah û fîxan û hewar in bihêre…"

Û wiha dewam dike diçe… Lewra des- tar amûrê hêranê ye. Yanî yê bişaftinê ye. Dema tiştek wekî den di wê kunka des- tarî de kete



nav herdû kevirên destarî, êdî ne gengaz e ku ew den wekî xwe bimî- ne. Di destarî de dexl û dan û garis û xace û şilêl û tale û genmok û kuncî û tiştên wisa den/dane dihêne hêran. Dema tiştekî wiha kete nav çerxên destarî diguhure. Mîsoger, jixwe pê ve dibe tiştekî din. Eger destar zû bihête rawestandin jî ew den qenebît birîndar dibe.

Dan dihêrin dibe danhêrk. Danîkan dihêrin dibe savar. Tale, xace, garis û şilêl jî wekî ar hûr nebin jî dibine arê tale, xace, garis û şilêlî. Zemanên berê bab û bapîrên me ji van xwarinan hemiyan sûd digirtin. Lê vê gavê dexil zêde bûye, ji ber hindê tale, xace û garis kêmtir in. Bes şilêlê ku berê bara pitir ji bo tomkê mirîşkan dihate çandin gelek bi qedir ketiye; bi tirkî dibêjinê "çavdar" û vê gavê nanê bi qîmetirîn û bihatirîn e.

Destar, di kelepor û jiyana kurdî de gelek girîng e. Hema bêje destar û conî li hemî malên kurdan de heye. Bes ev destar dîtbarî yê ew qas di jiyana me de girîng, bi awayê nedîtbariyê xwe ve girîngtir bûye.

Lewra min ev çîroka destarî hemî ji ber hindê gotin ku, em nemaze em kurdên Bakur ketine nav dev û didanên destarê bişaftinê/asîmîlasyonê. Destar me dihêre û dihêre. Vêca ya nexweştir ew e ku em bi kêfa xwe ketine nav devê destara bişaftinê. Di roja îroyîn de, miletê me bi rêzan û rêveberên xwe, bi zana û nivîskarên xwe ve yekcar li ber hêran û bişaftinê ne. Ji ber hindê pêwîst e em zûtirîn roj li xwe bizivirîn.

Nexwe dê wekî deneyeke dexlî bibîne ar û biçîn. Destarê danî bila bihêre, lê divêtin em nebîne den ku kes me nehêre!!!. Çavkanî: Diyarname 29 Reşemî r.14

Bi Kamîreya Zana Roj



## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji siya xwe jî ditirse:**
- Mirovekî pir tirsonek e.

**Ji şîr tirsiya pifî dew kir:**
- Dema yekî derbarê tiştekî de zerer dîtibe, gava dîsa tiştekî wisa tê pêşiyê, hingê dibêje)

**Ji tirsa avê pişta xwe da agir:**
- Rewşa wî ji ya berê xirabtir bû; çawa ku tê gotin, ji ber baranê çû ber şirikê.

**Ji xwe piştkul e:**
- Ji tiştên xwe yên xirab ditirse; ditirse ku tiştên wî yên xirab eşkere bibin.

**Ket pêxirkê:**
- Pir tirsiya; bizdiya; ziravê wî qetiya.
(Pêxirk ew e ku mirov nikaribe bimeşe lingên xwe bi erdê re bixirîne)

**Ketiye tayê/ketiye taya wê:**
- Ji niha ve ditirse; ditirse ku tiştek were serê wî.

**Kevirê xwe di ber xwe de berda:**
- Dest hilneanî; tirsiya; mêranî jê nehat.

**Kêlik pêş ve bû Mele Hacî:**
- Pir tirsiya.

**Kêrvoşka beriyê ye:**
- Pir zû ditise; tirsonek e; jixwetirs e; pir hay ji xwe dimîne.
Kunemişk lê bûye qeyserî.
- Pir tirsiyaye.
(Qeyserî: Sûka sergirtî)

**Li nava malê şêr e, li nava êlê pisîka bêkêr e:**
- Ji bo kesê li derve tirsonek tê gotin.

**Lingên min li pey min nehatin:**
- Ez pir tirsiyam.

**Lingno min hilînin:**
- Baz da; lez kir; reviya; tirsiya.


**Lingo qurbano:**
- Bi heman wateyê.

**Lingê xwe kişand ber xwe:**
- Tirsiya.

**Min mirin bi çavê serê xwe dît:**
- Ez pir êşiyam; ez pir tirsiyam.
Mûyên serê min bûn sîx (sinc)
- Ez pir tirsiyam.
Mûyên serê min zîq bûn.
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# 'Azadiya Rêber Apo mifteya çareseriya aloziyan e'



Berdevkê Insiyatîfa Sûrî ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir diyar kir ku azadiya Rêber Apo, kilîta çareserkirina aloziya Sûriyê û tevahiya Rojhilata Navîn e û got: "Pêwîste partî, alîgirên azadiyê û demokrasiyê, ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî têkoşîneke hiqûqî û siyasî bimeşînin."**R-5**

# 'Bi yekbûna jinan em ê Sûriyeke demokrat ava bikin'



Kordînsayona Kongra Star a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Rîhan Loqo destnîşan kir ku ew di wê baweriyê de ne ku her jineke azad karê welat û neteweyekê demokrat ava bike bi rêya hêz, îrade, fikir û felsefeya Jin Jiyan Azadî.**R-2**

Ronahî

Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1174 | 2-Pûşper-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ÊRIŞÊN DAGIRKERIYA TIRK NIKARIN VÎNA GELAN BIŞKÎNE

Bi armanca hedefgirtina îradeya gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, êrişên dagirkeriya Tirk dewam dikin, di êrişên herî dawiyê de yên li ser kantona Cizîrê jin, zarok û Ekîpên Destwerdana Lezgîn yên Heyva Sor a Kurd jî hatin hedefgirtin. Li hemberî van êrişan, her wiha li hemberî bêhelwestbûna navneteweyî, hevgirtin û girêdana gelên herêmê bi Rêveberiya Xweser û projeya Neteweya Demokratîk ve her ku diçe xurtir dibe.**R-3**



## Dewleta Tirk li Kurdistanê ekolojiyê qir dike



Hevserokê Desteya Ekolojîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Îbrahîm Eshed da xuyakirin ku armanca sîstemên hegemonîk ew e ku bi qirkirina ekolojik, cihên jiyanê û têkiliyên di navbera mirov û xwezayê de xirab bikin.**R-6**

## Bi çar ramanan çar berhemên bi wate



Bi nivîs û berhemên xwe Efrîna wêrankirî di rûpelên dîrokê de zindî dikin. Êşa koçberiyê ji xwe re kirin îrade û hêza têkbirina pilanên dagirkeriyê. Çar nivîskarên ji Efrînê li ser edebiyeta Kurdî çar berhemên bi wate zêde kirin.**R-7**



Ahmed Aktaş
**NATO, şerxwaziya xwe aşkere dike!** *R-4*

## 'Çeteyên bi navê 'Pêşmergeyên Roj' sîxurên dijmin in'



PDK'ê ya ku bi awayekî aktîf destekê dide êrişên dagirkeriya Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê û Rojava, planeke qirêj a nû li hewldanên xwe yên rewakirina dagirkeriyê zêde kiriye. PDK'ê di çarçoveya senaryoyeke nû de bi fermana MÎT'ê şandina hêzên xwe yên li Herêmên Parastinê yên Medyayê di bin navê welatiyên Başûr û ala Iraqê de, didomîne.**R-4**

# 'Bi yekbûna jinan em ê Sûriyeke demokrat ava bikin'

Kordînasyona Kongra Star a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Rîhan Loqo destnîşan kir ku ew di wê baweriyê de ne ku her jineke azad karê welat û netewekî demokrat ava bike bi rêya hêz, îrade, fikir û felsefeya Jin Jiyan Azadî.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Piştî şoreşa 19`ê Tîrmehê jinên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bûn mînak ji tevahî jinên cîhanê re ji ber pêşketina ku karîbûn di hişmendiya civakê de bidin guhertin, ev bi saya firk û felsefeya ku Rêber Abdullah Ocalan ji jinê re pêşkêş kir, êdî jin tevlî hemû qadên jiyanê bû di nav de jî aliyên wê yên civakî, aborî, leşkerî. Her wiha jin bi rengekî aktîf ji bona çareserkirina pirsgirêka Sûriyeyê cihê xwe digre û hewil dide ku roleke sereke di vî warî de bilîze.

Derbarê vê mijarê de kordînasyona Kongra Star a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Rîhanê Loqo ji rojnameya me re axivî.

Rîhan Loqo behsa kirîzên di Rojhilata Navîn, her wiha pirsgirêkên di tevahî cîhanê de weke kirîzên aborî, hişmendî, siyasî û hwd.. kir, bi taybet jî girêdayî hişmendiya nijadperest û olperest ku her dem jinê dûrî qadên jiyanê dike, lewma li gorî berjewendiyên xwe û çawaniya parastina van berjewendiyan siyaseta xwe ava dike, an em bêjin netewperestiya xwe çawa karibe derxînin pêş. Ev yek di Rojhilata Navîn de di dewletên neteweperet de vê siyasetê didin meşandin, dewleta Sûriyeyê jî parçeyek ji van dewletên Rojhilata Navîn e, li ser esasê siyaseta nijadperest, olperest û zayendperest vê siyasetê dide meşandin, û di pileya yekem de armanca wê ye ku jinê dûrî qadên jiyanê, mijarên civakî, siyasî û îdarî bixe, lewma bi yek alî giştî



Sûriya hatiye bi rêvebirin.

**'Yek ji pirsgirêkên sereke yên Rojhilata Navîn çareseriya pirsgirêka jinê ye'**

Rîhan Loqo wiha anî ser ziman:" Dema ku Rêber Apo behsa pirsgirêkên Rojhilata Navîn dike di nav van pirsgirêkan de çareserkirina pirsgirêka jinê tîne ser ziman, rêbazên çareserkirinê her wiha hewildanên li hember derketina alozî û hişmendiyên heyî, careke din berhemên dayikê radixîne pêş çava ku jin di dîrokê de hatiye nasîn bi zanebûn, felsefe û rêvebirina civakê û xwezyê û zanista jin li herêma Rojhilata Navîn vejîn û geş bikin.

**'Hewildanên çareserkirina aloziyan bi rêbazê yek alî'**

Rîhan Loqo diyar kir ku her dem hewildanên çareserkirina aloziyên gitşî yên herêma Rojhilata Navîn rêbazê yek alî derdixin pêş, sîstema vî rêbazî jî ne demokratîk, ne wekhevî û bê edaletî ye li ser vê yekê siyaset tê meşandin, lê welatiyên di van welatan de du alî jiyan dikin weke sîstema gerdûnî, nabe ku bi yek alî jiyan bikin û got: "Li ser vî esasî bi hişmendiya zilamperest derdikevin, bi vî rêbazî dixwazin çareseriyê derxînin, lewma em dibînin ku heta niha aloziyên Rojhilata Navîn, Kurdistan û ser asta cîhanê berdewam e ne tenê li Sûriyeyê."

**'Sedsala 21`an sedsala azadî û pêşengtiya jinê ye'**

Rîhan Loqo wiha axaftina xwe berdewam kir: "Yê ku ronkayî da ser vê tarîtiyê û çareseiyên guncaw derxist pêş Rêber Apo ye û ew ji bona jinê û pêşengtiya wê dibêje: (Di nava van welatan û şoreşan de wê pêşengtî ya jinê be), sedsala bîst û yekê wê bibe sedsala azadî û pêşengtiya jinan, wê jin bi pêşengtiya xwe civakek demokrat, bi edalet û wekhevî ku tevahî beşên civakê jê razî be ava bike, rêbazên çareserkirinê li gel jinan ji bo hemû pirsgirêkan, ji ber vê yekê çareserkirina pirsgirêka jinê çareserkirina tevahî aloziyên cîhanê ye. Ev rastiyeke ser vî esasî Rêber Apo dibêje(Rola pêşeng di nava tevahî kirîz û pirsgirêkên heyî de rola pêşeng ya jin ye), em di wê baweriyê de ne ku jin wê karibe tevahî van kirîzan bi dawî bike."

**'Jin bê navber li hember hişmendiyên kevneperest têkoşîn dike'**

Rîhan Loqo wiha pê de çû: "Ji dîrokê ve heta roja me ya îro jin bê navber li hember tevahî hişmendî û têgehên hişk ku ji hêla dewletên dagirker û faşîzim bi yek alî kar û xebatên xwe didin meşandin her wiha li hember şerê li dijî çand, erdnîgarî, hebûn û dîrokê têkoşîn bi salane tê kirin, da ku sîstemeke wekhev ava bike xebatan dide meşandin di heman demê de ji bo parastina ziman, dîroka jin û nasnamê di nava liv û tevgerê de ne, lewma li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şoreş bi şoreşa jinê hate nasîn û sîstemek xweser ya jinan hate ava kirin ew jî sîstema wekhevî, demokrasî û edalet, di nava komîn, deste, qadên civakî û perwerdeya xwe bi rêve bir û ev ji tevahî cîhanê re bû nimûne."

**'Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê sîstemek bi rengê jinê tê ava kirin'**

Rîhan Loqo wiha axaftina xwe domand: "Tevî ku di nava şoreşê de xebatên giring tên meşandin lê belê hîn em dibînin ku bê bawerî li hember sîstema jinê ji hêla dewletên desthilatdar ku xwe li ser zihniyeta baviksalarî ava kirin e tê dîtin. Ev yek hîn zêdetir bi hişmediya netewperest kar û xebatên xwe dimeşînin û li gorî qanûnên xwe yên neteweperest, ev pirsgirêk di herêmên di bin desthilatdariya rêjîma Sûriyeyê de berdewam e. Pirsgirêka astengkirina tevlîbûna jinê di nava xebatên siyasî û aborî de, her wiha aloziyên jinan weke kuştin, lêdan, revandin û tecawiz tên jiyan kirin. Ev yek nahêle ku rêbazên çareserkirinê li Sûriyeyê derkeve pêş, berovajî vê yekê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têkoşîneke mezin li hember vê yekê tê kirin li gel hevalên xort û mêr kar dikin, têkoşîna li hemberî wê zihniyeta ku bi salan li ser perwerde bûne tê kirin û sîstemek bi reng û nasnameya jinê tê ava kirin.

**'Her jinek welat û netewekî demokrat ava dike'**

Rîhan Loqo destnîşan kir ku bi rêbaz, sekin û zanista jinê em di wê baweriyê de ne ku wê ronîkirineke mezin li ser giştî civakê bê çêkirin, ne tenê li ser jinan, zarok û malbat jî di nav de. Ji ber ku bi jineke azad em dikarin malbateke azad ava bikin, malbata azad jî civakek azad û demokrat ava dike û civaka azad û demokrat jî netewek demokrat ava dike. Ev yek ji jineke azad destpê dike, lewma em di wê baweriyê de ne ku her jinek kare welatek û netewekî demokrat ava bike bi rêya hêz, îrade, fikir û felsefeya "Jin Jiyan Azadî".

Di dawiya axaftinên xwe de Rîhan Loqo wiha anî ziman:"Têkoşîna me her dem berdewam e û em hewil didin xwe bighînin beşên din yên Sûriyeyê, zêdetir bi jinên li wan herêman peywendiyan bikin, da ku em bi hev re hişmendiya jina azad û demokrat pêşbixin. Her wiha bi hev re Sûriyeke demokrat û pirrengî bi tevahî ol û bawerî, bi ziman û çandên xwe hatiye xuyanî kirin û demokrasiyekê rast ji civaka xwe re û giştî Sûriyeyê re ava bikin."

# Di navbera qanûn û kevneşopiyan de edaleta civakî (beşa 1)

**Nehîr Pale**

**Mala Jin di şert û mercên zehmet de hat vekirin**

2013-2017`an di bin navê exlaq û ol de çeteyên DAIŞ`ê zextekî giran li jin û civakê dikirin. Keç piştî temenê wan dibû 12 salî, her wiha jinên ku hevjînên wan mirine û jinên ku ew û hevjînên xwe dev ji hevdû berdane û li gel malbata xwe dimînin li gorî zagonên çeteyên DAIŞ`ê divê hemû bi çeteyên DAIŞ`ê re bizewicin. Çeteyên DAIŞ`ê xwe cahid didîtin û divê civak her tiştê xwe qurbanî wan bike. Bi taybet jin dibûn qurban. Dema çeteyek hatibane kuştin hevjîna wî radestî çeteyekî dîtir dihat kirin.

Li gel civakê tişta zehmet ew bû ku keçên xwe bidin çeteyên biyanî yên ji derveyî Sûriyê. Keç bi dolaran dihatin kirîn û firotin. Malbat hebûn ji neçarî keçên xwe didan çeteyên DAIŞ û hinek malbat hebûn dilê wan ketibû dolaran û keçên xwe difrotin DAIŞ`ê. Zextekî mezin li wê civaka Reqayê dihat kirin û her tişt li wan qedexe kiribûn.

Xewla El-Îsa yek ji jinên Reqayê ye ku destpêkê tevlî xebatên Mala Jin bûye û ji bo rewşa xwe wiha got: `Min Hiqûq dixwend û çeteyên DAIŞ`ê bi temamî xwendina beşê hiqûq qebûlnedikirin. Hejmarekî mezin ji xwendevanên zanîngeha Hiqûq neçar man dev ji xwendina xwe berdin. Min jî di encama zexta çeteyên DAIŞ`ê de dev ji xwendina xwe berda. Bi rizgarkirina bajarê Keramê re wextê em hîna li kampê bûn, min li Mala Jin dest bi xebatê kir`.

**Jin li Keramê Mala Jin vedikin**

Bajarê Keramê dikeve navbera Dêra Zor û bajarê Reqayê de. 23`ê Adarê 2017`an ji çeteyên DAIŞ`ê hat rizgar kirin. Xewle El-Îsa, Zehra Abdullah ya 45 salî, Emne El-Newaf ya 57 salî, Sîham El-Dêlic û Sewsen El-Hesen hîna çeteyên DAIŞ`ê li Reqayê ne û pevçûnên dijwar diqewimin Mala Jin li Keramê vedikin. Keramê li gorî xelkên herêmê hêlîna çeteyên DAIŞ`ê bû. Li Keramê hejmareke mezin ji mêran tevlî DAIŞ`ê bibûn.

Xewla El-Îsa têkildarî pêvajoya vekirina Mala Jin wiha got:`Keramê fîzîkî ji çeteyên DAIŞ`ê hatibû rizgarkirin lê belê zîhniyeta wan a DAIŞ'ê bû û li bendê bûn ku dîsa vegere herêmê. Dil û mejiyê civakê hatibû felc kirin. Li pey çeteyên DAIŞ`ê bi dehan jinên ku hevjînên wan bûn, mabûn. Hemû jî hîna temenê wan gelekî biçûk bûn. Malbatên wan dixwestin bi şêweyekî keçên xwe yên li pey DAIŞ`ê mabûn bidin berdan û bizewcîn in. Ji ber vê yekê dozên berdana jinan ji çeteyên DAIŞ`ê dihatin Mala Jin. `

**`Mêr derbasî Mala Jin nedibûn`**

Xewla têkildarî berteka mêran li beramberî Mala Jin wiha got:`Dema ku jin dozên xwe tanîn Mala jin me gazî mêran dikirin da ku em dozê çareser bikin. Mêr derbasî Mala Jin nedibûn, qebûlnedikirin ku pirsgirêkên xwe bibêjin û em çareser bikin. Digotin em Mala Jin nasnakin û bi wan re nacivin. Layiqî xwe nedidîtin ku werin bi me re birûnin. Li zora wan diçû û bawerî nedidan ku em bi edalet pirsgirkên jin û mêr çareser bikin.

Di vê mijarê de dayîka Zehra û Emne di çalakirina Mala Jin de gelekî westiyan. Keramê û gundên derdora wê nas dikirin. Emna dayîka şehîdan bû û Zehra jî hevjînê wê ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatibû kuştin. Xwendin û nivîsandina wan nebû lê wan Mala Jin birêve dibirin. Mal bi mal digeriyan û Mala Jin bi civakê didan naskirin. Ji jinan dixwestin ku werin Mala Jin mafên xwe bixwazin. Gelek caran dema ku diçûn malan ew pêşwazî nedikirin û diberdan wan. Dayîka Zehra û Emne xwe tu carî nedan paş û jin perwerde dikirin da ku mafên xwe bixwazin`.

**Mala Jin ciyê çareserkirina pirsgirkên jin e**

Xewla di berdewamiya gotinên xwe de got: `Di destpêka vekirina Mala Jin de dozên hevjînên çeteyên DAIŞ`ê dihatin gel me. Malbatên wan dixwestin qanûnî keçên xwe ji çeteyên DAIŞ`ê bidin berdan. Piştî ku jinan dîtin em dikarin pirsgirêkên wan çareser bikin êdî hemû pirsgirêkên xwe tînin gel Mala Jin. Hêdî-Hêdî xebatên me berferehtir bûn û heyanî roja îro Mala Jin di çareserkirina pirsgirkên jin de berpirsyartiyeke mezin rakiriye`.

**`Êrîşî Mala Jin kirin`**

Çima malbatan êrîşî Mala Jin dikirin Xewla e wiha anîn ziman:`Ji Keramê û gundên derdora wê jin dixwestin tevlî Asayîşê û QSD`ê bibin. Civakê ev yek bi namûsê û şerefê ve dida girêdan û heyanî niha jî qebûlnakin ku jin tevlî hêzên leşkerî û ewlehiyê bibin. Mala Jin bibû navnîşana destek û alîkarî dayîna jinan. Ji ber vê yekê berê xwe didan me û dixwestin em bi wan re bibin alîkar ku tevlî xebatê bibin.

Ji Keramê jinekê dixwest tevlî Asayîşê bibe û ji me xwest em pê re bibin alîkar. Piştî ku ew jin tevlî Asayîşê bû malbata wê êrîşî me kirin û tevlîbûna wê ya Asayîşê bi exlaq û şerefê ve dan girêdan. Me hewl da ku malbata wê bidin bawerkirin û qebûl bikin ku keça wan li Asayîşê bixebitê. Malbatê qebûl nekir lê keça wan ji nêrîna xwe nehat xwarê û tevlî hêzên Asayîşê bû. Piştî du salan ew û malbata xwe li hevhatin. Rojekê dema ew diçe serdana malbata xwe birayê wê veşartî wê tavêje bîra mala wan û bi keviran deriyê bîrê digre. Du mehan malbata li keça xwe digeriyan, piştî ku birayê wê yê ew kuştî reviya Lubnanê agahî dide malbata xwe ku xwişka xwe avêtiye bîrê û ew fetisandiye.

Her wiha berê her ku jin dozên xwe tanîn Mala Jin malbatên wan an jî eger zewicî bin malbatên hevjînên wan êrîşî Mala Jin dikirin. Qebûlnedikirin ku jin li dozên jinê binêrin û çareser bikin`.



# Bi çar ramanan çar berhemên bi wate

Bi nivîs û berhemên xwe Efrîna wêrankirî di rûpelên dîrokê de zindî dikin. Êşa koçberiyê ji xwe re kirin îrade û hêza têkbirina pilanên dagirkeriyê. Çar nivîskarên ji Efrînê li ser edebiyeta Kurdî çar berhemên bi wate zêde kirin.

**Zana Roj/ Şehba**

Li hember siyasetên dagirkeriyê û zehmetiyên koçberiyê îradeya wan ya lêgerîn û afirîneriyê tu carî nehat têk birin. Gelê Efrînê di hemû şert û mercên zehmet yên koçberiyê, êrîşên dagirkeriya Tirkiyê û dorpêça hikumeta Şamê bi hêz û vîneke bê hempa ji 6 salan ve li ber xwe didin. Di hundir herêma Şehbayê de her roj kêliyên berxwedan, têkoşîn û afirandina jianê tên nûjenkirin. Di nava benca koçberiyê de berhemên nû hatin derketin. ji aliyê çar nivîskarên Efrînî ve ku li herêma Şehbayê jiyan dikin çar pirtûk hatin çap kirin û îmzekirin. Derbarê berhemên ku hatine derketin de nivîskarên her çar pirtûkan ji rojnameya me re axivîn.

**Pirtûka Hînkera Îngilîzî ya Rohay Bekir**

Rohay Bekir keçikeke ji Efrînê ye û di Tevgera Kevana Zêrîn de kar dike. Rohayî berhemek derbarê fêrbûna Zimanê Îngilîzî bi şîrovekirin û elfebaya Kurdî nivîsandiye. Rohay di derbare pirtûka xwe de wiha axivî :"Bi mezinbûna nifşên nû re pêwîstî bi zengînkirina zimanê kurdî heye. Li ser wê bingehê min xwest ku pirtûkeke derbare fêrbûna zimanê inglîzî bi zimanê û şîrovekirina kurdî amede bikim. Bê guman bi mezinbûna nifşên nû bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, her ku zimanê dayîkê jî zengîntir û berferehtir dibe her wiha bi hezran zarokên me li ser minhaj û elfebeya Kurdî di dibistanan de perwerde dibin. Li ser esasê xwendin û perwerdebûna bi zimanê Kurdî pir xwendekar nikarin zimanekî din bi hêsanî fêr bibin û bixwînin. Çawa ku di cîhanê de zimanên biyanî bi elfebeya Erebî ya zimanên fermî yên welatekî tên amedekirin û fêrkirin. Min jî xwest ji bo hêsankirina fêrbûna zimanê Îngilîzî ji nifşên îro re, ez pirtukeke biçûk bi zimanê Îngilîzî û Kurdî amede bikin. pirtûk di bingeh de bi zimanê Îngilîzî hatiye amede kirin û piştre bi mamosteytên zimanê Kurdî re bi zimanê Kurdî hatiye şîrovekirin û bilêvkirin".



Rohay Bekir



Cîhad Hemdûş



Silêman Cafer

**Pirtûka Jana Dil ya nivîska Cîhad Hemdûş**

Cîhad Hemdûş di oxira doza azadiya Kurdistanê de welatparêzekî xwedî ked e. Mamoste Cîhad ji Gundê Xirabî Şera ye. Ji Malbatekî Şûyî ye, ji zaroktiya xwe ve bi ziman û elfebeya Kurdî re mijûl bûye û li ser wê bingehê xebat kiriye. Mamoste Cîhad anî ziman ku ew di zaroktiyê xwe de li ser dengê Radyoya Yêrîvan mezin bûye, her wiha ji ber meşandina xebatên şoreşgerî ji aliyê sîstema Sûriyê ve ji xwendin û karmendiyê hatiye qedexekirin. Gelek nivîs , gutar û helbestên wî hene. Herî dawî pirtûka Jana Dil ya helbestan nivîsandiye.

Mamoste Cîhad bi van gotinan behsa pirtûka xwe kir: "Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ji bo me û bi taybet ji bo rewşenbîran bû derfet ku hêz û zanebpna xwe derxînin holê. Rewşenbîr weke stûnê civakê û divê rola xwe di civakê de bilîze. Pirtûka min ya helbestan yê bi navê (Jana Dil) bi hezkirinek pir mezin hat nivîsandin. Hejmarek ji helbestên cur be cur tê de hene. Tirsa min her ew bû ku ez bimirin û pirtûka min nekeve destê nivşên me, lê ez niha gelek memnûn û kêfxweşim ku pirtûka min hate çap kirin".

**Pirtûka Hestên Bêrîkirinê ya Fewaz Reşo**

Fewaz Reşo ji gundê hesendêra ya navçeya Bilbilê ye. di demên Efrînê de weke Mamosteyê Zimanê Kurdî bû. Di Efrînê de jî dest bi nivîsandina helbestan bi zimanê Kurdî kiribû, lê ji ber şerê Efrînê ew berhem hemû hatin windakirin. Fewaz niha weke Edîtor û wergervan di acansa Hawarê de kar dike.

Fewaz di derbarê hezkirina xwe ji helbest nivsandinê re wiha axivî: "Bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê re di Efrînê de ez fêrî zimanê Kurdî bûm. Bi hezkirina zimanê Kurdî re min xwest ez helbestan bi zimanê Kurdî binivsînim di sala 2016 an de min dest bi nivîsandina helbestan kir. Qederek ji helbestên ku min li ser kaxizan nivîsandibûn hebûm, lê derfet her nebû ku ez çap bikim. Bi êrîşên li ser Efrînê re em mecbûr man ku derkevin û ew berhem di Efrînê de hatin windakirin û şewitandin. Di Şehbayê de careke din min xweste bi derketina ji Efrîn re her wiha bi êş û hestên bêrîkirinê re min dest bi nivîsandina helbestan kir. giştî helbestên min li ser hestên bêrîkirinê ne ji lewra min navê pirtûkê kir (Hestên Bêrîkirinê)".

**Pirtûka Ola Êzîdî ya Silêman Cafer**

Silêman Cafer welatparêzekî gelek kevar e û ji ola Êzîdiya ye. Civaka Êzîdî herî zêde di Efrînê hene û ola xwe parastine. Mamoste Silêma jî di oxira ola Êzîdiyan de lêkolî û berhemên gelek bi nirx çêkirine. Pirtûka bi navê (Qewlên Êzîdiyan) weke yekemîn pirtûk ji aliyê Silêman Cafer ve bi zimanê Kurdî li ser asta cîhanê hatiye amede kirin. herî dawê jî pirtûka bi navê (Ola Êzîdî) bi zimanê Erebî nivîsandiye.

Mamoste Silêma bi van gotinan hestên xwe anîn ziman: "Pirtûka (Qewlên Êzîdiyan) di encama keda 30 salî de hate amedekirin. Di çapkirina wê pirtûkê de gelek zehmetî hatin dîtin û hejmarek pir kêm çap bû. Ew weke pirtûka yekemîn derbarê Ol û Qewlên Êzîdiyan bi berfirehî û bi zimanê Kurdî hate amedekirin. Ew pirtûk xwedî taybetmendiyeke gelek cuda ye gel min. hêviya min ya yekemîn ew e ku ez wê pirtûkê diyarî Rêber APO bikim. Rêber APO feylesof û Rêberê yekemîn e ku ol û civaka Êzîdî parast û piştgirî da Kurdên Êzîdî. Pirtûka min ya (Ola Êzîdiyan) ya ku min bi zimanê Erebî nivîsandiye, careke din hejmareke gelek kêm hatiye çap kirin her wiha ez vê pirtûkê diyarî malbatên Şehîdan dikim".

# Meyrem Xan pêşenga dengbêjî û hunera kurdî ye

Meryem xan ku di nava me kurdan de cihekî xwe ya taybet heye, bêguman divê mirov ji naskirina wê jî bêpar nemîne.

Di demeke ku di civaka me kurdan de derketina jinê di pir aliyan de şerm dihat dîtin, lê Meryem xan wek yekem jina kurd ew şerm û qedexeya ser jinê ji bo xwe nehewand û bi huner û dengê xwe pêşengtî ji tevahiya jinan re kir. Herwaha Meryem xan li hember hemû astengiyan serî netewand û heta roja me ya îro jî stranên Meryem xanê li ser zimanên hunermend û dengbêjên jin yên kurd de ye.

Meryem Xan, di sala 1904 an de li gundê Dêrgolê yê ser bi bajarê Şirnex a Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye. Herwaha zaroktiya xwe jî li gundê xwe derbas kir.

Mixabin piştî demekî Meryem xan û malbata xwe naçarî koçberiyê dibin û berê xwe didin bajarê Musilê.



Piştre berê xwe didin bajarê Qamişlo û dûre berê xwe didin paytexta Sûriyê Şamê.

Meryem xan bi yekî ji malbata Bedirxanî re dizewicê lê li gor agahiyan ji ber ku hevjînê wê Mîre û qebûl nake ku Meryem xan di karê hunerî de cih bigre neçar dibe ji hevjînê xwe veqete. Herweha li gor agahiyan veqetîna Meryem xanê ji hevjînê wê êşeke mezin di dilê wê de ava dike û dibe sedem ku Meryem xan her li wê derê koç bike û berê xwe bide Iraqê. Meryem xan demekî li Mûsilê dimîne piştre diçe Bexdayê, li mala keça mamê xwe Elmas û piştî demekî malekî ji bo xwe kirê dike. Meryem xan li Bexdayê di weşaneke radyoyê ya li Bexdayê di beşa kurdî de dest bi kar û xebata xwe ya hunerî dike. Wê demê destpêka weşana wê radyo ya Bexdayê bûye ji ber zîrekî û jêhatî bûna Meryem xanê rêvebiriya beşa kurdî didine wê. Di wê demê de di nava civaka me kurdan de mixabin ku dengbêjî û hunermediya jinê weke şermek mezin dihat dîtin lê Meryem xanê li hember vê paşverûtiyê bi huner û dengbêjiya xwe şer kir û tekoşîneke bê hempa da nîşandan û gelek astengî ji hole rakirin. Meyrem Xan bi vî awayî karî bibe yek ji jinên kurd a pêşeng û rêya dengbêjî û huner hilbijart. Herçend ev rê ji bo jinekê gelek zehmet bû jî, lê wê li hember şerm û qedexeya li ser jinê berxwe da û geheşte armanca xwe. Meyrem Xan yekemîn jina kurd e, ku bi wêrekî stranên xwe tomar kir û bi rêya kasêtan stranên wê hatin belavkirin, bi vî awayî Meryem xan yek ji wan jinên kurd e ku bi stran û dengbêjiya xwe folklora kurdî parast herwaha bi dengbêjiya xwe serkêşiya netewa kurdî û ji bo nifşê nû bû rêya berdewamiya folklora netewa kurd a resen. Di stranên Meryem xanê de, evîn û hezkirina welat diyar û xuya ye. Di wan stranan de gellek serpêhatiyên kurdan derbas dibin; mîna strana "Karwanê mala bavê Sêvê, Mehemd Selîm zavakî taz e, Wa Axawo"

Meryem xan di koşk û dîwanxaneya malbatê de helbestvan, nivîskar û kilambêj dicivandin, deriyê mala wê ji hemû hunermendên kurd re herdem vekirî bû. Dengbêja hêja Meryem Xan temenê xwe di nava xizanî û rebeniyê de derbas kir, dawiyê ji ber nexweşiya gurçikan, di sala 1949 an jiyana xwe ji dest da. Zêdetirî 200 stran û kilamên wê hene.

Jin a kurd a dengbêj herçend zû diçe ser dilovaniya xwe lê li dû xwe kaniyeke mezin ya keda xweya zêrîn ji bo me bicîh hîşt.

• **LAWIKÊN NASKIRÎ YÊN MERYEM XANÊ STRAYE:** 1 – Wele Domam2 – Bavê Koroxlî3 – Mehmed Selîm zavekî taze4 – Li xelkê tehlê, lê li min şêrînê (Helîm) 5 – Gewra min tu nîn e6 – Sîwrê me sîwar bûne7 – Mihemedo ronî8 – Sêvê û Hecî Elî9 – Lê Lê Yadê Rebenê 10 – Hesenê Pisman11 – Elî Delal

• **BESTEYÊN GELÊRÎ KU MERYEM XAN STRAYE:**

1 – Qûmrîkê sêva tucara2 – Girê Sîra bi sîr e3 – Hey berde berde4 – Lê lê Wesê5 – Hey la li min xerîbê6 – Gulşenî7 – Lê dînê lê dînê8 – Gulê hey nar9 – Emo (Du qolî bi dengê Seîd Axa û Meyrem Xanê) 10 – Mêremê

# Dewleta Tirk li Kurdistanê ekolojiyê qir dike

Hevserokê Desteya Ekolojîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Îbrahîm Eshed da xuyakirin ku armanca sîstemên hegemonîk ew e ku bi qirkirina ekolojik, cihên jiyanê û têkiliyên di navbera mirov û xwezayê de xirab bikin.

**Tekoşîn Amara/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker li Kurdistanê hemû cûreyên qirkirina ekolojîk dide meşandin, hevserokê desteya Ekolojîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Îbrahîm Eshed ji rojnameya me re axivî.

**Qirkirina ekolojî şewazê şerê taybet li Kurdistanê ye**

Îbrahîm Eshed diyar kir ku gelê kurd li hemberî hemû cûreyên qirkirinê tekoşîn dike, qirkirinê vala derdixe û wiha got: "Di sedsala 20. mîn de bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê, gelê kurd weke darên berû, ji nûve li ser koka xwe vejîn bû . Ev rastî li ber çavên cîhanê û dagirkeriyê heqîqeteke ku lê mikûr tên. Ji ber wê hemû dagirkerên li Kurdistanê û bi taybet dagirkeriya dewleta Tirk di şêwazên valakirina Kurdistanê de serpişt ketin. Lewra berê xwe dan şêwazê şerê taybet li Kurdistanê. Bi taybet gelê kurd bi xaka xwe ve û bi xweza û erdnîgariya xwe ve girêdayî yê, di jiyana gelê kurd de navê erdnîgarî û xweza wek kurdîstanê girîng û bi wate ye."



**Armanca dewleta Tirk ew e ku tekîliya navbera însan û xweza xirab bike**

Îbrahîm di dewama axaftina xwe de wiha got: "Armanca sîstemên hegemonîk ew e ku bi qirkirina ekolojîk, cîhên jiyanê û tekîliyên di navbera însan û xwezayê de xirab bike. Lewra civak berê xwe dide koçberiyê ku revekî ji ax û welatê xwe û dûrketin çêdibe. Dema ku civakek ango mirovek koçber bû, edî ew civak mertalên xwe yên xwe parastinê winda dike. Ev hişmendiya qirker a ku li ser civakê tê meşandin hişmendiya netewperest û desthilatdare û hertim li dijî civakbûnê û ekolojiye dixebite, herwiha tekîliyê civakê ji ekolojiye qut dike. Hişmendiya dagirkeran li ser tunekirina kurdan dimeşe, ev hişmendî bi paradigmeya ekolojî ya Rêber Abdullah Ocelan hat şikestin û vala derxistin."

**Sermayeder û dagirker hevdû destek dikin**

Îbrahîm ragihand ku hişmendiyên desthilatdar û sermayedar bi yek armancê têdikoşin ji bo qirkirina ekoloji û wiha anî ziman: "Di qadên navnetewî de jî sîstemên hegomonîk rûxmê ku vî dijminahiyê dibinin ji ber berjewendî û qazancên zêde ên desthilatdariyê nahêlên ku destekê bidin civakê. Lewra li hemberê qirkirina ekolojîk a ku li Kurdistanê tê meşandin bê deng dimînin."

**Kurd di berbanga tekoşîn û berxwedanê de ne**

Îbrahîm di berdevamiya axaftina xwe de nişan kir ku ji bo kar û xebatên dijitî û hişmendiya dagirkeriyê li Kurdistanê gelê kurd di berbanga berxwedaniyê de ye û domand: "Ev berxwedan di hemû serdeman de bi rengekî hatiye meşandin, di roja me ya îro de bi şêwazên zanistî têne meşandin. Ji xwe paradigmaya Netewa Demokratîk ya Rêber Apo ku îro li cîhanê deng vedayê û li ser tê nîqaşkirin. Li ser vî bingehê paradigmaya ekolojî, tekoşîn û berxwedana li beramberî hişmendiya qirkirina ekolojî di nav kar û xebatan de ye."

Di dewama axaftina xwe de Îbrahîm Esed işaret bi êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser civak û ekolojiya li herêmê kir û got, "Dewleta Tirk bi rêk û pêk qirkirina ekolojîk û civakî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike. Hem dewleta Tirk hem jî hikumeta Şamê her roj êrîşan dibin ser modela Rêveberiya Xweser. Bêguman ev êrîş pir alî ne û li her qada jiyanê têne kirin. Bi destê hikumeta Şamê li herêmê gelek êrîşên cuda yên mîna narkotîkê têne kirin. Rêveberiya Xweser li hemberî van êrîşan bi hemû saziyên xwe her roj li ber xwe dide. Weke Komîteya Ekolojiyê me jî li hemberî vê yekê kar kirin. Ji bo me gelekî girîng e ku xwezayê ji her alî ve biparêzin. Pêwîstiya berxwedana ekolojî ne tenê li Kurdistanê, lê belê li tevahî cîhanê bi destek dayîn tevger,partî,rêxistin û çalakvanên ekolojî ençex were kirin. Ji bo Kurdistanê taybet pêwîste ku di qada navnetewî de berxwedanek bêhempa were kirin. Ji ber ku qirkirinaka sîstematîk tê kirin û ji aliyê din ve jî enternatîfê ku ev aloziya ekolojîk di cîhanê de were derbas kirin û çareser kirin heye. Bi piradîgmeya ekolojî em ê karibin seranserî cîhanê ekolojîyê biserbixin."

Hêjayî bibîrxistinê ye ku di navbera 26 – 27'ê Nîsana 2024'an de li Bakur û Rojhelatê Sûriyê konfiransa desteya jîngehê hate li darxistin. Ev konfirans di bin dirûşmeya "Bi piradîgmeya ekolojî, Rêber Abdullah Ocalan azad bikin û doza Kurd çareser bikin". Ev konfirans li ser asta Rojava-Bakûr û Rojhelatê Sûriyayê û cîhanê hat lidarxistin. Bi tevlîbûna 13 ekademîsyen û çalekvanên ekolojî li seranserî cîhanê beşdarê konferansa ekolojî bûn. Ji welatên cuda gelek aktîvîstên ekolojiyê û akademîsyen tevlî bûn. Di konferansê de karên heyî û karên bêne kirin hatin nirxandin û gihîşt encamekî.

# Medyaya Dijîtal û bandora wê li ser civakê

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

Medyaya Civakî di serdema me ya heyî de, bi aliyê xwe yê erênî û neyênî roleke giring di jiyana mirovahiyê de dilîze û bandoreke mezin li ser çand, aborî, tendirustî û têkiliyên giştî yên civakê dike.

Di serdema heyî de Medyaya Civakî bandoreke mezin li jiyana mirovahiyê dike, bikaranîna şaş ya Medyaya Civakî têkiliyên civakî tune dike û bi awayekî neyinî bandorê li ser zarokan û tenduristiya mêjiyê wan dike, herwiha roleke wê ya erênî jî heye ku dihêle hin kesayet sûdê jê bigrin weke bazirganiyî an lêkolînkirina hin mijaran û di warê perwerdeyê.

**Destpêka înternêtê**

Toreya înternêtê di sala 1960'î de weke amûrek danûstendina agahiyan ji bo lêkolînerên hikumetê destpê kir, komputerek mezin li ser tevahî agahî hebû, diviyabû bighêjin vê komputerê da ku ji agahiyên li ser sûdê bigrin, katalîzatorek di avabûna toreya Enternêtê hebû ew jî bilindkirina şerê sar bû, Yekîtiya Sovyetan peyka (sputnik) da destpêkirin ji hêla Wezareta Parastina Emerîkî, di dawî de toreya ajansa parojeyên lêkolînên pêşketî ARPANET hate avakirin (Advanced Research Projects Agency Network) toreya ku di dawî de hate pêşketin ku niha bi navê înternêt tê nasîn.

**Belavbûna Medyaya Civakî**

Medyaya Civakî bi awayekî bi lez û bez belav bû, gelek malper hatin derketin di dema me ya heyî de yên herî bi nav û deng jî wiha ne:

- Di sala 2005`an malpera bi navê (Youtube) hat damezrandin.
- Di sala 2006`an malpera Facbook ji hêla (Mark Zuckerberg) hat avakirin û ji hemî bikarhênerên li çar aliyê cîhanê re jî dihat peydakirin. piştî wê bû yek ji malperên herî navdar di serdema heyî de ku nêzî 1 milyar û 700 milyon kesî ve tê bikaranîn.
-Di sala 2006`an malperek nû ya Medyaya Civakî bi navê ( Twitter) hat avakirin, destpêkê weke malperek biçûk bû ji bo nivîsandinê, lê piştî wê bû yek ji maplerên navdar di Medyaya Civakî de.
- Di dawiya sala 2010`an (Instagram) ji hêla (Kevin Systrom) hat derxistin tenê ji bo belavkirina wêneyan di riya enternêtê de, lê di sala 2012`an ji hêla Kampaniya Facbook ve hate kirîn.
- Derketina malperan nehat sekinandin û malperên nû hatin derketin weke malpera( Snapchat) ku ji hêla (Evan Spiegel, Reggie Brown, û Bobby Murphy) xwendekarên Zanîngeha Stanford ji bo belavkirina vîdyoyên kurt.
-Malpera Medyaya Civakî ya herî dawî derket di sala 2016`an ji hêla kampaniya ( ByteDance) ya Çînî ( Tik Tok) bû ku hejmara bikarhênerên wê di destpêka sala 2020`an gihaşt 800 milyon bikarhêner li ser asta cîhanê.



**Bandorên erênî yên Medyaya Dijîtal li ser civakê:**

**-Zêdekirina hilberîna zanistî:**
Medyaya Civakî hilbirîna zanistî ya civakan zêdetir dike, ew dihêle ku komên bikahêneran ku heman fikrên wan yên zanistî hene di tevahî waran de weke; tenduristî, siyaset û aborî û ji xeynî wê ku karibin danûstendinê bikin zanîn û tecrûbeyên xwe bi hev re parve bikin.

**-Platformek raghandina azad e:**
Medyaya Civakî weke platformeke medyayê tê hesibandin dihêle ku kesayet nêrînên xwe bi azadî îfade bikin bêyî ku bi ti zagonên zordar ên ku rê li ber azadiya derbirînê digire ve girêdayî bin.

**-Zêdekirina hişmendiyê di mijarên civakî de:**
Medyaya civakî dihêle ku ferdên di civakê de mijarên giring li gorî wan civakan nîqaş bikin çi mijarên olî an exlaqî be û ji xeynî wî ev yek dihêle ku hişmendiya mirov bi wan mijaran zêdetir bibe.

**-Xurtkirina hêza Aborî:**
Gelek kampaniyayên karsazî û bazirganiyê medyaya civakî bi kar tînin, ji bo têkiliyan xwe xurt bikin û hilberên xwe bifiroşin, herwiha medyaya civakî ji ber lêçûna kêm a darayî ya ku ji bo pêkanîna prosedurên aborî yên lêkolînê li bazareke taybetî hewce dike; xwedan avantajek aborî ye. Hin malper jî rê didin kesan ku dest bi karsaziyên xwe bikin, ku ji wan re dahatiyek baş çêdike û dibe sedema serxwebûna darayî.

**-Giringiya malperên elektronîk di warê perwerdeyê de:**
Malper bi rêya ansîklopediyên elektronîk û malperên pispor ên di hin cureyên zanist û zanînê de bêpere agahiyan didin kesan, êdî her kes dikare zanyara ku dixwaze bi dest bixe û agahî her kêlî bi hêsanî dikare were bidest xistin. Malperên elektronik alîkariya kesên ku dixwazin xwendina xwe berdewam bikin; dike di riya xwendina ji dûr ve. Di malperên elektronik de vîdeo û madeyên perwerdeyê ku pêvajoya xwendinê xurt dike hene.

**Bandorên neyinî yên medyaya dijîtal li ser civakê**

**-Girêdana bi înternêtê:**
Bikaranîna zêde ya medyaya civakî di rêya înternêtê û temaşekirina domdar ya rêzefîlman dibe sedema girêdana bi enternêtê ve, bi vê yekê bandorê li ser tenduristiya kesan dike, ew dibe sedema nexweşiyên ne ji rê ve , nerehetî û tirsa zêde ku dibe sedema êrişên panîkê.

**2-Bandorê li ser têkiliyên malbatî dike:**
Bikaranîna medyaya civakî dibe ku bandorên neyinî û erênî jî li ser malbatê bike, ji hêla erênî dibe sedema berdewamiya têkiliyên zarokan yên ku ji dê û bav dûr ketine di encamên şer an berdanê û hwd.. Ji hêla neyinî dibe sedema ji hev qutbûyîna malbatê û civakê di riya bikaranîna şaş ji medyaya civakî weke: berdewamiya temaşekirina zarokan dîmenên ku tundî tê de heye li ser televîzyonê tirs di nava wan de ava dike ew dibe sedema guhertina şêwazên wan û pirsgirêkên exlaqî çêdike weke êrîşkariyê herwiha nexweşiyên xewê bi wan re çêdibe, hin ciwan lîstokên wek bobcî û enternêtê yên tund bi kar tînin ev yek bandorê zêdetir li ser şêwazên wan dike herwiha dîmenên kesên ku çixareyê û madeyên hişbirê vedixwin wan teşwîq dike ku ew jî bicerbînin.

**-Belavbûna gotegotan û nûçeyên derewîn:**
Di rêya medyaya civakî de hinek kes an alî nûçeyên derewîn belav dikin da ku bighêjin armanc û berjewendiyên xwe, ev yek gelek caran di welatên ku alozî û nakokiyan jiyan dike çêdibe, weke gotegotên çêbûna şer ev yek dihêle ku xelk ji malên xwe derkevin û ji welatên xwe koçber bibin, nimûneya li gel me şerê ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tê û şerê taybet ku dagrkeriya Tirk di rêya ajanên xwe di rêya medyaya civakî li ser gelê herêmê dimeşîne, ev dibe sedema zirarên manewî li mirovan dike.

**- Şideta elektronik ya li ser zarokan:**
Medyaya civakî carna dibe amûrek e li dijî zarokan ku di civakê de bi xeletî tê bikar anîn, ji ber ku wan dike li ber zordariya elektronîkî û ev yek dikare bandorê li zarokan û tenduristiya wan a derûnî bike. Ew dibe sedem ku ew bi depresyonê derbikevin.

**-Dibe sedema zêdebûna fobiya civakî:**
Bikaranîna zêde ya medyaya civakî dibe sedema zêdebûna hestên tenêtî û îzolasyonê, pêşkeftina fobiya civakî dibe sedem ku mirov baweriya xwe bi xwe û bi kesayeta xwe winda bike, nahêle ku beşdarî boneyên civakî bibe û danûstendina rasterast bi mirovan re bike ev yek bandorê li ser tenduristiya mirovan ya pîskolojîk dike weke xemgînî û depresyonê.



# Li dijî Îradeya gelan êrişên dagirkeriya Tirk berdewam in

Bi armanca hedefgirtina îradya gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, êrişên dagirkeriya Tirk dewam dikin, di êrişên herî dawiyê de yên li ser Kantona Cizîrê jin, zarok û Ekîpên Destwerdana Lezgîn yên Heyva Sor a Kurd jî hatin hedefgirtin. Li hemberî van êrişan, herwiha li hemberî bêhelwestbûna navneteweyî, hevgirtin û girêdana gelên herêmê bi Rêveberiya Xweser û projeya Neteweya Demokratîk ve her ku diçe xurtir dibe.

**Navenda Nûçeyan**

Di 31'ê Gulanê de dewleta Tir a dagirker bi balafirên bêmirov gundên Henwa û Selmase yên girêdayî bajarê Til Hemîsê yê kantona Cizîrê bombebaran kirin. Dema ku şênî ji bo rakirina birîndaran berî dan cihê bûyerê dewleta Tirk a dagirker careke din êrişek hewayî pêk anî. Di êrişê de jin û zarok jî di nav de 11 welatî birîndar bûn. Ji birîndarên êrişa dewleta Tirk a dagirker a li ser gundewarê Til Hemîsê navên 9 birîndaran hatin zanîn. Piraniya birîndaran ji malbata Mûsa ye , welatiyn birîndar li nexweşxaneyên bajarê Qamişlo tên dermankirin. Navên 9 birîndaran hatin zanîn jî wiha ne : Mûsa Mûsa (60), Emîra El Mûsa (40), Nuha Mûsa, (20)Meryem Dawûd Mehmûd (52), Hanî Yasîn Mûsa (30), Leys Îbrahîm Mûsa (17), Mihemed Mûsa (11), Ezedîn Silêman Mûsa (30) û Qeys Mûsa (17).



Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê jî bi daxuyaniyekê ragehand ku di encama êrişên ser gundên Henwa û Selmase yên girêdayî bajarê Til Hemîsê yê kantona Cizîrê de 4 şervanên wan şehîd bûn.

QSD'ê di daxuyaniya xwe de wiha got: "Dewleta Tirk a dagirker îro Înê di saetên piştî nîvro û yên ber êvarî de bi balafirên bê mirov ên bi çek 8 caran êrişî nuqteyên hêzên me, mal û erebeyên sivîlan kirin. Di encama êrişan şehîd û birîndar çêbûn. Dewleta Tirk a dagirker bi balafira bê mirov a bi çek li herêma Til Hemîsê nuqteyek hêzên me û li derdora bajarê Qamişloyê nuqteya Hêzên Erka Xweparastinê bombebaran kirin. Artêşa dagirker li Qamişlo du caran malên sivîlan û 3 caran erebeyên sivîlan bombebaran kirin. Di encamê de 11 sivîl birîndar bûn. Dewleta Tirk bi balafireke bê mirov a bi çek erebeya ambulansê ya ku hewl dide şehîd û birîndaran rake jî kir hedef. Di encama êrişên dewleta Tirk a dagirker de 4 şervanên me gihaştin asta şehadetê û 11 sivîl birîndar bûn."

**'Em bang rêxistinên navneteweyî dikin ku li hemberî êrişên dagirkeriya Tirk rabin'**

Têkldarî êrişî Heyva Sor a Kurd bi daxuyaniyekê ragehandin ku ekîpeke wê dema hewl dide xwe bighîne birîndarên êrişên balafirên bêmirov yên dewleta Tirk a dagirker, hat hedefkirin. Heyva Sor a Kurd di daxuyaniya xwe de wiha got: "Balafirên dewleta Tirk a dagirker, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek dever bombebaran kirin. Ekîpên destwerdana lezgîn a Heyva Sor a Kurd ji bo rakirin û dermankrina birîndaran û qurbaniyên êrişê destwerdan kirin. Dema ku ekîpên me yên tenduristiyê ekra xwe bi cih dianî û hewl da xwe bighîne birîndaran, balafira Tirk wê li herêma Amûdê nêzî gundê Hatimiyê bombebaran kir. Di encama bombebaranê de erebeya ambulansê bi temamî ji xizmetê derket. Ev ne cara yekê ye ku dewleta Tirk erebeyên ambulansê yên di warê mirovî de dixebitin û nîşaneyên zelal ên xaç û Heyva Sor li ser in, dike hedef. Wekî rêxistineke mirovî ku li bakurê Sûriyeyê dixebite, bêyî garantiya parastineke têrek ji bo ekîpên me, em nikarin erka xwe ya mirovî pêk bînin. Li ser vê yekê em bang li rêxistinên tevkar û yên navneteweyî dikin ku li hemberî êrişên dewleta Tirka dagirker ku aşkera xebatkarên qada mirov û xizmetuzariyê li bakurê Sûriyeyê dike armanc, rabin."

**'Li dijî êrişan hevgertina xwe xurtir bikin'**

Di heman çarçoveyê de Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê êrişên dewleta Tirk a dagirker bi tûndî şermezar kir û bang li gelê herêmê kir ku hevgirtina xwe li dijî êrişên dagirkeriyê bihêztir bikin.

Rêveberiya Xweser di daxuyaniya xwe de ku ev êriş sûcekî din e û berdewama siyaseta qirkirin û dorpêça li ser herêmê ye. Di dawiyê de sersaxî ji malbatên şehîdên êrişa dewleta Tirk re hat xwestin û şîfaya lezgîn ji birîndaran re hat xwestin.





# Di ser revandina Silêman Ehmed re 222 roj derbas bûn

**Rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed ku ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin, piştî 211 rojan agahî jê hat girtin. Parêzeran di 22'yê Gulanê de karîn hevdîtinê li gel Silêman Ehmed bikin. Rojnamevan Silêman Ehmed 222 rojin ji aliyê PDK'ê ve tê girtin.**

Edîtorê beşa Erebî ya ajansa ROJnews'ê Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmeha 2023'yan ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25'ê Cotmeha 2023'yan dema xwest di deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin û piştî heft mehan parêzeran karîn hevdîtinê li gel de bikin.



Rojnamevan Silêman Ehmed 222 rojin ji aliyê PDK'ê ve tê girtin.

Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê di daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast de got ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine.

Herî dawî di bin zextên sivîl yên rojnameger, sendîka û rêxistinên li ser asta herêmî û navnetewî de, roja 22'yê Gulanê destûr hat dayîn ku parêzerên wî li girtîgeha Asayîşa Dihokê hevdîtinê pê re bikin.

Yek ji parêzerên Silêman Ehmed, Beşdar Hesen di derbarê hevdîtina li gel Silêman wiha got: "Em bi Silêman Ehmed re li odeyekê rûniştin. Di hevdîtinê de Silêman Ehmed spasiya hemû kesên ku ji bo wî hewl dane kir û silavek taybet ji hemû xebatkarên Ajansa Rojnewsê re şand. Her wiha Silêman Ehmed spasiya hemû rêxistin, sendîka, rojnamevan û welatparêzan kir ku hewl dane wî azad bikin. Em gelek keyfxweşin ku me rewşa tenduristiya wî baş dît, tenê daxwaza wî ew bû ku heta serbest bê berdan zextên heyî berdewam bike."

Parêzer Beşdar Hesen tekez kir ku niha li gor madeya 1 a yasaya jimare 21 ya sala 2003 ya Parlamentoya Kurdistanê, ku girêdayî 'têkdana ewlekariya netewî' ye, zêdetir ji 7 mehane ji aliyê dadwer ve tê ragirtin û got; "Lê belê heta niha tu tomet li ser wî nehatine tesbîtkirin. Me parêznameya wî wergirt û piştre serdana dadwerê Dadgeha Lêkolînê ya Asayîşa Duhokê kir û got deriyê me ji we re wek parêzer vekirî ye."

Her wiha Parêzer Beşdar Hesen got; "Emê di demên pêş de ji bo ku doza wî bibin dadgehê xebatên xwe zêdetir bikin û ji xelkê re ragihînin ku çi rojek Silêman Ehmed bê dadgehkirin wê bê berdan. Em geşbînîn ku bi kêfxweşî mizgîniya berdana wî didin. Bi gotina wî, heta niha bi tiştên tê tometbarkirin nehatiye ispatkirin û di dema lêpirsînê de derketiye holê ku bi awayekî fermî çûye Rojavayê Kurdistanê û vegeriyaye û xwediyê destûra rûniştinê ye."

# 'Çeteyên bi navê 'Pêşmergeyên Roj' sîxurên dijmin in'

PDK'ê ya ku bi awayekî aktîf destekê dide êrîşên dagirkeriya Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê û Rojava, planeke qirêj a nû li hewldanên xwe yên rewa kirina dagirkeriyê zêde kiriye. PDK'ê di çarçoveya senaryoyeke nû de bi fermana MÎT'ê şandina hêzên xwe yên li Herêmên Parastinê yên Medyayê di bin navê welatiyên Başûr û ala Iraqê de, didomîne.

**Amara Baran/ Qamişlo**

**Pêşmergeyên Roj kî ne?**

Çeteyên bi navê Pêşmergên Roj ji 3 tugayan pêk tê û perwerdeyên leşkerî wergirtine. Tugaya yekemîn li ser hemû cureyên çekan û şerên cûda hatine perwerdekirin û ev tugaya ku ji aliye Hemîd Riyad Selahedîn ve tê birêvebirin, yek ji komên girîng di nava Pêşmergeyên Roj de ye. Tugaya duyemîn û ya sêyemîn ji sedî 93 kesên girêdayî Partî Demokratî Kurdistan li Sûriyeyê (PDK-S) digire nava xwe û piraniya wan temen mezin in. Her tugayek ji wan hezar û 250 endaman pêk tê, ango giştî hejmara wan derdora 3 hezar û 750 leşker e û di nava wan de nêzî 200 endamên pêşmerge yên ji Başûrê Kurdistanê jî cîh digrin.

Tevî hişyariyên pêşengên Tevgera Azadiya Civaka Kurd û tevahiya gelê Kurd, careke din hate îspatkirin ku PDK'ê ya ku her cure derfetên îstîxbaratî, lojîstîk, ewlekarî, stargeh û veguhestinê dide dewleta Tirk a dagirker rasterast bi vê planê tevlî şer dibe. Ji ber ku dewleta Tirk di çarçoveya plana navborî de hêzên di bin nav û ala Iraqê de şandiye hin cihên zehmet ku nikare bikeviyê, ji aliyê gelê herêmê bi taybet Amediye û Bradostê ve bû sedema bertekên mezin.

Fermandarê berê yê, 'Pêşmergeyên Roj' Hemîd Riyad Selehedîn, derbarê vê koma pêşmergeyên Roj de ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze dijî gerîlayên Azadiya Kurdistanê bide şerkirin ji rojnameya me re axivî.

**PDK'e ji bo ku hebûna xwe mayînde bike nasnameyên sexte çêdike**

Hemîd Riyad da xûyakirin ku PDK'ê ji bo pêngava yekemîn a peymanan ket nava tevgerê, ji bo mayîndekirina hebûna xwe ya li derdora Qadên Parastina Medyayê hewil dide ji çeteyên Roj ên hêzên paramîlîter nasnameyên sexte yên Iraqî wekî malbatên Iraqî nîşan bidin derxist. Pêngava duyemîn jî ew e ku lîsteya çeteyên Roj ên ku nasnameyên sexte ji wan re hatine derxistin, wê ji aliyê PDK'ê ve bi hikûmeta Iraqê re were parvekirin û ji wan re were ragihandin ku dikarin di xeta sînorê Iraq-Tirkiye de (Herêmên Parastina Medyayê) cih bigirin.

**'Zarokên Rojava di temenekî biçûk de tevlî pêşmergê Roj bûn'**

Hemîd Riyad da zanîn ku gelek ciwanên di sala 2012' an de ji Rojava derbasê Başûrê Kurdistanê bûbûn temenê wan 15,16,17 û 18 salî bûn û wiha domand: "Berpirsiyarê hêzên leşkerî Lîwa Ezîz Weysî daxwaz ji van ciwanan kir ji bo ku neçin Awropa û hêzekî bi navê Pêşmergê Roj ava bikin, dema ku hêza yek çêbû ez cîgirê hêza yekbûm. Di nav perwerdeyên wê demê de perwerdeyên sîyasî tunebûn tenê 45 rojan perwerdeya leşkerî li ser bingehê ku li bajaran çawa şer were kirin dihat dayîn. Piştre jî pêşmergê Gulan û Xinis hatin damezrandin. Bi damezrandina hêza sêyemîn îstîxbarata Tirk ew kire di bin kontrola xwe de û Xwarin û çekên teqemenî ji aliyê MÎT a tirk ve dihat, wê demê hate naskirin ku ev hêz ji bo berjewendiyên MÎT a tirk têne amedekirin û perwerdekirin."

**'SADAT li Duhokê Çeteyan perwerde dike'**

Hamîd bibîrxist ku kampaniyaya SADAT a ku çeteyan perwerde dike û dişîne gelek welatan, ji sala 2018'an û vir ve komek ji 20 endamên pispor ên di warê ewlekariyê de hatine Başûrê Kurdistanê û li herêma Xensê ya Duhokê çeteyên Roj perwerde dike û wiha domand: "Dîsa bi berfirehî hate nîqaşkirin ku peywira sereke ya SADAT'ê avakirina komên çete yên ji bo dagirkirina cihên ji derveyî Tirkiyeyê û perwerdekirina partî, rêxistin û alîgirên dewleta Tirk a dagirker e. Têkiliyên SADAT'ê yên bi MÎT'ê re bi rêya Gulnur Aybat ku yek ji şêwirmendên Recep Tayyîp Erdogan e û bi nêzîkbûna xwe ya bi Nêçîrvan Barzanî re tê naskirin, pêk tê. Çeteyên ku berê beşdarî êrîşên li dijî Şengal, Rojavayê Kurdistanê û Lîbyayê bibûn, niha bi hêzên Zêrevan û Gulan re şandine Herêmên Parastinê yên Medyayê."

**Tu hêz nikare berxwedana gerîla bibin bixe**

Hemîd Riyad di dewamiya axaftina xwe de wiha got: "Gelek kes bi navê parezgehên sînor têne perwerdekirin, herwiha 450 ciwanên ji şengelê jî li Dohokê têne perwerdekirin ku tevlê artêşa dewleta Tirk bibin. Dewleta Tirk herçiqas



eskeran perwerde bike jî nikare hêza gerîla bin bixe, min bi xwe berxwedaniya ku gerîla dide meşandin dît li hemberî çetetyên peşmergeyên Roj, dewleta Tirk bi hemû çeken nuklerî her roj erîş dibe ser qadên gerîla da ku îradeya wan bin bixe. Dewleta tirk û mala Barzanî ji bo ku fikir û felsefya Rêber Apo ji holê rabikin di nav civaka kurd de fitneyan çêdikin."

**'Li çiyayê Kurdistanê pêşmergê Gulan û Roj sîxortiyê dikin'**

Hemîd dîyarkir ku dewleta tirk ji bo ku hêzên gerîla li çiyayê Kurdistanê tune bike ji hêzên cur be cur sîxora avadike û wiha got: "Pêşmergê Roj û gulan li çiyayê Kurdistanê ji bo ku lojîstîk û çûyîn û hatina gerîla tespit bikin ji dewleta re sîxortiyê dikin. Her wiha bi cerdevanan re di nav tekîliyê de ne noqteyên stratejîk û noqteyên hevalan tespit dikin û teslîmê cerdevana dikin. Komên Pêşmergeyên Roj alîkariya xwe ji Tirkiyeyê û bi koordîneya bi rayedarên başûrê Kurdistanê re werdigirin "Gelek aliyan serdana navendên Pêşmergeyên Roj dikir, Tirkiyeyê jî aşkere serdana van koman dikir û gelek efserên Tirk beşdarî perwerdeyên endamên Pêşmergeyên Roj dibûn. Rayedarên Başûr jî îdia dikirin ku ev efser girêdayî Koalîsyona Navneteweyî ne. Ez piştrast dikim ku tu girêdana van efseran bi koalîsyonê re tune bû. Alîkariya ku ji me re dihat de gelekî mezin bû û Başûr nikare vê alîkariyê pêşkêş bike. Aliyê ku fînanseya me dikir nedihat nasîn. Li gorî nêrîna me, min û hevalên xwe piştrast kir ku ev alîkarî ji Tirkiyeyê tê."

**ENKS'ê Rêveberiya Xweser û QSD'ê reş dike**

Hemîd Riyad anî ziman "Pêştê min siyaseta PDK' ê naskir Me biryar da ku em vegerin welat û nav gelê xwe Ji ber ku min zêde israr kir werim Rojava, ez û 60 endamên din xistin girtîgehê 4 mehan di girtîgehê de man. Şerekî taybet li dijî QSD û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hebû. Ji pêşmegeriyan re digotin, 'heke hûn vegerin dê we bikujin'. Lê belê dema ez hatim tiştek wisa nebû, bi awayekî baş hatim pêşwazîkirin."

**Dewleta Tirk piştê hilbijartinê Bakûrê Kurdistanê tengav bû**

Hemîd îşaret pê kir ku" piştê hilbijartinê 30 nîsanê ku li bakurê kurdîstanê hatbûn çekirin hîşt ku dewleta tirk a dagirker tengav bibe, û wiha anî ziman" di newroza 2024'an de dema ku Dewleta Tirk yekbûyîna gelan dît ev jî hişt ku Erdoxan bikeve nav liv û tevgerê . Cara yekemin bu kul i peytexta tirkan de weneyên Rêber Abdullah Ocelan hatin rakirin û bi şîarên " berxwedan jîyane û bêjî Serok Apo" berzkirin. Ev jî hişt ku Erdoxan bi rêka mala barzanî xwest erîşên qadên parastina gel bike. Hewilda ku biçe serokê Amerîka Baydin re hevdîtin bike lê Baydin ev hevdîtina Erdoxan redkir. Ev planê xwe yên qirêj li başurê kurdîstanê dixwaze pek bîne rûxmê hemû nerazîbûnê xelkê duhok û Bexdayê jî êala barzanî di nav hevkariyekî qirej dane.

Hemîd Riyad di dawiya axaftina xwe bang li hemû endamên Pêşmergeyên Roj kir ku neyine leyîstokê Dewleta Tirk û nebin hevkar û vegerin warên xwe û beşdarî parastina axa xwe bibin û li dijî komên terorîst ku hewl didin destkeftiyên gel têk bibin, li ber xwe bidin.



## NATO, şerxwaziya xwe aşkere dike!

**Ahmet Aktaş**

Sekreterê giştî yê NATO Jens Stoltenberg, di civîna Parlamenterên NATO de ya li Sofya-paytextê Bulgaristanê pêkhat, axaftinek balkêş, bêxêr û xeter kir.

Axaftinên Stoltenberg, pir zelal û aşkere armanca saziya xwe nîşan dide, ku bi hişmendî şer dixwaze. Konferansa Aştiyê ya Siwisreyê jî rexne dike û beşdar nabin.

Her wiha aliyên şer jî dest nîşan dike û dibêje, "dewletên endamên NATOyê ne, lazime piştgriya xwe ya Ukraynayê hîn xurtir bikin, çekên girantir û meda wan dirêj bixin xizmeta hêzên bergirî yên Ukraynayê, da ku karibin derbeyên mezin li baregehên leşkerî yên li navenda Rusyayê bixin"!

Rexne û pêşniyazên xwe didomîne û sedemên ku heta niha Rûsya derbeyên mezin nexwariye û ji Ukraynayê ne hatiye derxistin, hilwestên xemsar yên dewletên NATO yê nîşan dide.

Herwiha dibêje, "ji bo ku em Rûsya ji Ukraynayê derxin û rê li pêşketina Çînê bigirin, divê DYEyê, dewletên rojava û NATOyê, destekên xwe yên ji Ukraynayê re zêdetir bikin!"

Li pey van gotinên Stoltenberg, di serî de DYE yê biryar da ku li dor 100 milyar dolar alîkariyê bişîne, Belçika 30 heb F-16 dişîne Ukraynayê, tê gotin Fransa jî wê hêzên leşkerî bişîne Ukraynayê û hwd.

Li gel van hilwestên şerxwaz ên hinek dewletan, dudilî jî ket navbera dewletan û yên li dijî vê hilwesta Stoltenberg derketin, mîna İtalya, Macaristan, Bulgaristan hene û Elmanya jî dudil e.

Di encamê de jî daxwiyaniyên Stoltenberg tê zanîn ku, ji bo mezinkirina şerê cîhanê, dest bi amadekariyên mezin dikin. Bêgûman van gotinan ji eqlê xwe yê jor, ji DYE yê û hegemonên din distîne û weke erkê xwe yê fermî van daxwiyaniyan dide.

Her wiha dewletên giregirên G7an, di civîna xwe de, xwestine dest bidin ser 300 milyar dolarên Rûsya yên li derve û vî pereyî weke destek bidin Ukrayneyê!

Tê gotin ku heke G7, di civîna xwe ya 13-15 ê Hezîranê de, vê daxwaza xwe bikin biryar, xetera mezinbûn û dijwarbûna şerê Ukrayna-Rusya dikeve rojevê, her wiha ev tê wateya gûrbûna şerê cihanê yê 3yan!

Di gotinên wî de, mijarek din jî ya giring ev e û dibêje: Erê Rûsya dikare bixwe çekên mezin ên şer çêbike, lê alîkariya herî mezin di aliyê çekên hewayî de yên bê mirov Îran dike û her cûre amûrên mikroekonomik jî Çîn didê.

Li vira dîsa diyar dibe ku armanc ne tinê Rûsya ye, belê hema yekser Çîn e û Îranê jî dixin ber armancên xwe. Jixwe ew mijara ketina helikoptera Îranê ya mirina Reîsî û heyeta wî jî, divê neyê jibîr kirin û dibe ku parçeyek ji vê armancê be.

Jiber ku plana wan a ku bi şerê navbera Israilê û Filistinê re şer li Rojhilata Navîn mezintir bikin, weke ku dixwestin nemeşiya, lewma gûman xurt dibe ku bixwazin dîsa vegerin şerê navbera Ukrayna-Rusya germtir bikin. Jixwe gotinek din jî heye ku bi lez Ukraynayê bikin endamê NATOyê!

Her bi çi awayî be Kurdistan ji vî şerê bêxêr ê cîhanê ne berê ye, berovajî, dibe navenda vî şerî. Lewma dive tevgera gelê me bê amadekarî nemîne!



# 'Azadiya Rêber Apo mifteya çareseriya aloziyan e'

Berdevkê Insiyatîfa Suriyê ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir diyar kir ku azadiya Rêber Apo, kilîta çareserkirina aloziya Sûriyê û tevahiya Rojhilata Navîn e û got: "Pêwîste partî, alîgirên azadiyê û demokrasiyê, ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî têkoşîneke hiqûqî û siyasî bimeşînin."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Însiyatîfa ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê, di çarçoveya pêngava navneteweyî ya 'Ji Abdullah Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareserî' de serdana 33`ê partiyan kir. Pêngava navneteweyî ya ku dostên Kurdan û demokratan ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka Kurd hat destpêkirin, êdî roj bi roj firehtir û çalaktir dibe û bi armanca ku têkoşîna qanûnî, hiqûqî û siyasî ji vê xurttir bidin meşandin û partî li hember tecrîdê helwesta xwe bikin yek. Di vê çaçoveyê de berdevkê Insiyatîfa Suriyê ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir ji Rojnemeya me re axivî.

Ferzende Munzir balkişand ser serdana Partiyên siyasî û ancamên wê û wiha got: "Armanca me ji serdanên partiyan di çarçoveya pêngava cîhanî ya ku bi duruşmeya 'Ji Rêber Apo re azadî û ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî', ye. Me dixwest ku peyama û helwestên partiyan jî di derbarê pêngava azadiya Rêber Abdullah Ocalan bigin. Her wiha me xwest ji



wiha zêpdetir ev partî tevlî pêngavê bibin ku xebat û berhemên xwe hîn zêdetir bidin pêş ji bo azadiya Rêber Apo a fîzîkî. Armanca me ew bû jî ku Rêber Apo bibe Rojeve her partiyekê. Li ser vê bingihê me serdana 33`ê partiyan kir û di heman demê de nîqaşên berferher di derbarê rewşa Rêber Apo de hat kirin, li ser 12 rojan ev serdan dewam kir. Ev partî jî, partiyên kurdan, ereban, suriyanan û aşûriyan bû. Her wiha ev serdana partiyan ne cara yakema ku Insiyatîfa Suriyê ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan pê radibe, ev cara 3'me û her wê berdewam be."

**'Pêwîste her kes xwe berpisyar bibîne'**

Ferzenade di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Di serdanên patiyan de gelek nîqaş hat kirin û encam jî hat girtin. Di nava van nîqaşan de, nîqaşên siyasî, hiqûqî, fikirî û hete li ser çalakiyê ku ji bo azadiya Rêber pêk tên, hat kirin. Her wiha cîhan tevahî dibîne ku azadiya Rêber Apo çaraseriya tevahî pirsgirêkane û edelet wê xwe bide pêş. Pêwîste ku tekoşîna me ji wiha zêdetir û aktîvtir be, da ku em vê pêngavê bi ser bixin û Rêber Abdullah Ocalan fîzîkî azad bikin. Nameyên ku me ji rêxistin û aliyên navneteweyî re şandin, pêşinyar hat kirin ku ji Rojhilata Navîn re jî were şandin. Me van namyên ku li ser rola Rêber Apo û doza kurd ji Rojhilata Navîn re şand. Şikandina tecrîdê û azadiya Rêber Apo ne tenê insiyatîf berpisiyare, pêwîste her kes xwe berpisyar bibîne û bi erkên xwe yê ku ji bo azadiya Rêber Apo rabin, îro ev gav ji hesî tê xwestin. Em dikarin bêjin ku serdanên me ji bo partiyan cihê hêz û moralê bû."

**'Em dixwazin her kesî bixin bin berpisiyaritya wan ya dîrokî de'**

Ferzende Munzir di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku li gorî peymanên cîhanî pêwîste Rêber Abdullah Ocalan fîzîkî azad bibe û wiha qedand: "Xebatên me ji bo insiyatîfê û bi taybet ji gelek saziyên hiqûqî û tendirustî yên cîhanî re me name li ser rewşa Rêber Abdullah Ocalan re, radestî wan hat kirin. Her wiha niha jî li gor van peymanên cîhanî pêwîste Rêber Apo azad bibe, ji ber ku neheqiyeke mezin li hemberî wî



tê meşandin û heya niha ti agahî jê nayê girtin ku rewşa wî ya tendirustî çawa ye di çi astengiyan re derbas dibe. Ji ber vê yekê me name li ser rewşa Rêber Aop ji hemû saziyên cîhanî re şandin da ku rewşa Rêber Apo were diyar kirin û azadiya wî ya fîzîkî pêk were. Rasta em dixwazin her kesî bixin bin berpisiyartiya wî ya dîrokî de û bi erkên xwe yê exlaqî rabin, ev doz doza sedsalê û mirovahiyê ye. Em heya dawî li berxwe bidin û pêngava azadiya Rêber Apo wê hîn zêdetir mezin û berferhtir bibe ku êdî tevahî cîhan daxwaza azadiya rêber Apo dikin û azadiya Rêber Apo bi wate dibînin. Azadiya Rêber Apo, kilîta çareserkirina aloziyên Rojhilata Navîn û aloziya Sûriyeyê ye. Ji ber wê divê partî, alîgirên azadiyê û demokrasiyê, ji bo azadiya wî ya fîzîkî têkoşîneke hiqûqî û siyasî bimeşînin."

# 'Dewleta Tirk û rêjîma Îranê li dijî doza kurd hertim hevkar in'

**Argeş Gewda/Qamişlo**

**Civaknasê Kurd Kakşar Oremar dîyar kir ku dewletên Kurdistan dagir kirine herdem ji bo qirkirina gelê kurd di nava plan û hevkariyê de ne.Herwiha Oremar da xuyakirin ku rêjîma Îran û dewleta Tirk a dagirker tu caran ji bo berjewndiyên gelên herêmê kar nakin û lihevkirina wan her dem li ser dirêjkirina desthilatdariyê ye .**

Siyaseta qirêj ya ku dewletên dagirker yên ser axa Kurdistanê dimeşînin bi sedan salan didomin. Parçeyên herî mezin yên Kurdistanê yê Bakur û Rojhilatê welat herî zêde sîyaseta şerên taybet û polîtîka li ser tê meşandine. Derbarê siyasetên Rêjîma Îran û dewleta Tirk a dagirker yên li dijî gelê Kurd Civaknasê Kurd Kakşar Oremar ji rojnameye mera axivî.

**Ev Planên qirêj ji demên Sefewî û Osmanîyan ve tên meşandin**

Kakşar Oremar dîyar kir ku peywendiyên navbera Îran û Tirkiyê de tevî hin guhertinan jî xwe dispêre demên kevin û wiha



got: "Peywendiyên dewletên dagirker yên wekî Tirkiyê û Îranê ji serdemên Sefewiyan û Osmaniyan dest pê dike, heya dema navê hikumetê dibe Komara Îslamî ya Îranê dewam dike.Herwiha ev têkilî di dema serokkomarê Îranê Haşim Rehşencanî, Hatemî, Ehmedî Necad û heya roja me ya îro serok wezîrê jîyana xwe ji dest dayî Ibrahim Reîsî jî, berdewam e. Peywendiyên wan dewletan her tim di nava guherandinê de. Heya dema komara Tirkiyê jî ava dibe ev têkiliyên xwe zidetir pêş dixin. Lê di rastiyê de Tirk û Îran zêde hev hesnakin, tenê ji ber parçeyên Kurdistanê yên Rojhilat û Îranê ji hevdû cuda bikin peywewndiyê navbera xwe de dimeşînin weke ku ti pirsgirêk navbera wan de nînin, didin xuyakirin. Belê di rastîyê de gelek nakokiyên cidî di navbera wan de hene."

**Tirkiyê û Îran ji bo pirsgrêka Kurd çareser nekin hem hevrikin û hem jî hevalin**

Oremar wiha berdewam kir: "Xalên ku tê de hevgirtinê çê dikin ji holêrakirina gelê Kurd e. Ji ber ku di aliyê hejmara herî zide Kurd li wan parçan jiyan dikin. Di her du dewletan de jî tirsa herî mezin meşandina sîyaseta demokratîk ya Kurd e. Ji ber ku ev şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi fikir û felsefeya Rêber Apo hatiye avakirin, bandora xwe ser wan her du parçeyan nekin peywendiyên xwe yên ser asta berjewendiyan tên meşandin de, didomînin. Pergala li Tirkiyê tê meşandin di sala 1923 û heya 1950'yî de tênê rêxistinek li ser desthilatiya Tirk bû ev jî Partîya Gelan Ya Komar (CHP) bû. Rêveberîya wê partiyê Atatûrk dikir. Piştra pergal hat guhertin bû qaşo sîstema parlemanto. Lê ya rastiyê de tê xuyakirin navbera wan guhertina date ferq û cuda hîn nine. Her dû jî nezî hevin û ser bingeha nijad perestîya Tirk hatiye avakirin. Rastiyê de pergala Tirkîyê pergala dîktatorî ye. HEP`ê heya Dem partîyê pir partî û rêxistinên Kurd avabûn û pir zext û zordarî ser wan hatin



meşandin. Îran bin navê mezheba Şîa `de gelek welatan rexistin ava kirin. Peywendiyên navbera Îran û Tirkîyê em dikarin sê şêwaza binrxnin. Ji bona her du parçeyên Kurdistanê nebin yêk dujmintîya nav xwe de dihêlin alîyekî dibin dost û hevalên herî xurt. Piştî şoreşa Rojhilatê Kurdistanê pêk hatiyê, jineke Kurd ya bi navê Jîna Mehsa Emînî ji aliyê rejîma Îranê ve hat qetilkirin. Gelê Kurd yên li wir dijîn bi diruşmeya ``Jin Jiyan Azadî` serhildanek dan destpêkirin. Ev dilê Tirkîyê de bû tirs û xofeke mezin. Jibona ev serhildan bandora xwe ser Bakurê Kurdistamê jî ava neke herdem Tirkiyê li gel rêjîma Îranê nav hesabên qirêj dabûn. "

**Jin Jiyan Azadî fikir û felsefeya Rêber Apo bingeh digire**

Oremar axiftina xwe wiha bi dawî kir: " Tirkiye û Îran jî baş dizanin ku yê azadiya jin diparêze û artêşek jin daye avakirin fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan e. Ev durişmeya jin jiyan azadî jî bi fikr û felsefa Rêber Apo û Tevgera Azadiyê çêbûye. Ji bona bandora xwe zidetir ser gel nede avakirin navbera her du sînoran peywendî xort kirin û sîxur zide kirin. Em a bila ti cara neyê jibîrkirin Azadîya Kurdistanê û jin û ciwanên ve Jîna Emînî bi azadîya Rêber Apo`ra girêdayî ye." û axiftina xwe bi dawi kir."